GULAN
VEGERANDINA OMÊDAN E

B/ Babê Kovanî

Demê ku yek bixwaze li ser şorişa Gulanê rabiweste, li destpêkê gerek e hindek ji sedemên hilbûna wê bihîne ser ziman. Yek ji mezintirîn şorişên neteweya kurd şorişa Îlonê bû, bi pilaneka mezin ya nîvdewletî hat jinavbirin. Hukûmeta Îraqê ya wî demî, zû dest bi erebkirin û be'sîkirina kurd û deverên wan kir û amadekariyên mezin kirin ji bo veguhaztina kurdan bo başûr û naverasta Îraqê. Helbet, vê yekê û mukumkariya kurdan li ser berdewambûna şorişa gelî bo serdemê herî serek, ku şoriş carek din hilbûye, li şeva 25/26ê Gulana 1976-ê gulleya yekê hate teqandin. Vê yekê moralê neteweya kurd bilind kir ve, şoriş ber bi berfirehiyê çû û di hindek qûnaxan de derbaz bû.

1- Qûnaxa yekan: lê dide û bireva ji Gulan 26-ê Gulan 1976-ê ta 1980-ê.

2- Qûnaxa duyê: beravanîkirin ji deverên rizgar ji 1980 - 1985 -ê.

3- Qûnaxa hêrişên mezin û tomarkirina dastanan û rizgarkirina bajêrk û komelegan û cihên stratîjî li deverê, ji 1985 -ê ta destpêkirina enfalan.

Li vê derê, gereke were baskirin ku şorişê gavên mezin havêtin û

guhertinên diramatîk bi xwe ve dîtin ji hemû aliyan ve, ramyarî, aborî û leşkerî, yan di warê ragehandinê de.

Li destpêkê, şorişê karî, hevbendên xurt bi gelek ji bizavên azadîxwaz re girê bide û beşdarî kongireyên siyasî bibe, dîsan û ji aliyê leşkerê me û piştgiriya gelê Kurd şorişê roj bi roj pêşketin bi xwe ve dît û karî di çend salekan de ji şerê partîzanî derbazî qûnaxan şerên leşkeriyê bibe, dastana tomar bike û deverên mezin rizgar bike. Tiştê ku pitir têkoşîn germ dikir û moralê gel û pêşmergeyê Kurdistanê bilind dikir, ragehandina bi hêza şorişa bû vê alî giring ji xebatê, behrek pirr mezin ji pûtedana serkirdeya PDK bi alî xwe ve kêşabû, di vî warî de her çende jimareyeka mezin ji belavok û kovarên şorişê mîna kovara Metîn leqê 1, Sefîn leqê 2, Babagurgur leqê 3, Ezmer leqê 4, Rizgarî leqê 8 li rojhelatê Kurdistanê, Zagros li Emerîka û Keneda, Gazî ya xwandekar û lawan leqê 1, Seda Kurdistan li Lubnanê bi zimanê Erebî, kovara pêşmerge bi zimanê Îngilîzî li Awrupa belav dibû û Xebat bi zimanê halê partî), lê êstgehê dengê Kurdistana Îraqê demê li roja 19.5.1980 -yê ketiye karî, bi pêngava hewe mezin hate naskirin û dengê wê yê zelal karî bigehe hemû Kurdistanê û dengê kar û xebata têkoşerên kurd bi hemû kurdan re bigehîne û bibe çavkaniyek yekê ya bihîstî bo dengê şorişê. Xaleka din ku dibe were baskirin, xala terorê ye, ku her ji gava yekê dijî şorişê hatibû bikarhînan û bi hemû rengan.

Rijêmî, bi siyaseta xerabkirin û valakirina gundan dest pê kir, di peyrewê girtin û kujtina bi sedan ji xortên kurdan, bi behaneya rêxistinên nihênî, paşan bikarhînana napalm û çekê fesforî ta ku gehiştiye bilindtirîn pileya terorîzmê û çekê kîmayî dijî Helebce û Behdînan û deverên din bi kar hînayî.

Enfalan dest pê kir. Lê, wek ku serokê Kurdistanê dibêje:((Em serbilind in ji ber ku tomara me pak û xawên e, serbarê wê yekê ku gelek teror dijî me hatiye bikarhînan û gelek xedir li me hatiye kirin, belê em bi merdane li qadê rawestan û me dest ne da çekên terorê û îro em berhemê wî helwîstî pak dibînin.

Li dawiyê dê bibêjim, bi dirêjiya şorişê hindek xalên erênî û hindek jî nerênî kar kirine ser pêvajoya şorişê ji wan xalan:

1- Serketina şorişê îslamî li Îranê sala 1979-ê.

2- Wexera dawiyê ya bavê ruhî, Barzaniyê nemir sala l 979-ê.

3- Destpêkirina şerî di navbera Îraqê û Îranê de li 1980-yê.

4- Wexera dawî ya kak Idrîsê Barzanî li 1986-ê.

5- Rawestna şerê Îraqê û Îranê.

6- Enfal û kîma barankirina Helebce û deverên din yên Kurdistanê

Lê, her çawa be Gulan destpêka qûnaxek nû bû ji şorişa gelê kurd ku ew jî paşan bo sedemê serhildanê û rewşa niha.